Êrîşa li ser goristana Dugirê û bêdengiya kor

Bêwar Brahîm

Çi kesê ku romana" Ximyager" ya Paulo Koylo xwendibe wê gavên çêkirina zêr xweş naskiribe, her welatek ji vê cîhanê xwedî dîrokeke taybete ji çêkirina zêr re û em Kurd ji vê dîrokê ne bê parin, vajî wê dîroka me dîdevane ku afrenerên zêr ji xwe miletê Kurd e, lê çima ev afirandina wan ta vê kêlîkê ne navdare û nebûye afirandineke navnetewî??? Brsev gelekî hêsane ji ber çi zêrê ku ji destê Kurdan tê afirandin di nav komirê de winda dibe û xelik li tiştên hazrkirî digerin. Heke em helbestên Umer Xiyam û Melayê Cizîrî bidin ber hev wê cudabûn di navbera wan de weke dûrbûna di navbera erd û asman de be, dil berî çav wê bêje ku helbestên Cezîrî ji yên Xiyam xweştirin,lê Umerê Xiyam bi xwedî bû îro helbestên wî bûne tablo û bi dîwarên mozexaneyên cîhanî ve daliqandîne û yên Melayê Cizîrî piraniya Kurdan nema wan dixwînin.

Di çi berxwedanan de be, ji bo jiyanê be, ji bo felat û azadiyê be, ji bo hizir û ramanan be bawerî pêwîste û ev bawerî li ser çar stûnên bingehîn ava dibe: Dilinyabûn, aramî, berxwedan û dadî. Di gel ku dadî li ser rûyê xakê li ber nemabûnê ye, lê heke ev bernemabûna dadiyê, dilinyabûn, aramî û berxwedan di rûyê setemkariyê de bibin yek wê karibin pişta vê setemkariyê bişkînin û heke ew bi xwe piştşikenandî bibin hewldan destpêka serketinaye.

Gelek caran mirov nikare bi keştiyên bayewanî gozarîyê vajî bahozan bike, lê dema ti rêk û çare ji felatê re nemîne êdî bê hemdî xwe rû li rû bi bahozan re dimîne û ew û şensê xwe, yan wê rêka felata xwe di dilê bahozan de vekin û yan wê ev bahoz wan bi hilmkişandinekê daqurtînin.

Pirsa kûr û mezin ewe:

-Dema ku ev mirov mirî bin û di bin baskên şevên reştarî de bahoz bên û kêlên ber serê wan, dîwar û çeperên derdora goran bişkînin, wê ev mirî bi çi şêwazê li ber xwe bidin û xezeba van bahozan ji ser xwe vegerînin û xwe ji mirina windabûn û nepeniyê biparêzin???

Dibêjin:" Civat serperiştê biryara xwe ye", civatên goristanan û bi taybetî afirenerên zêr û almas, wê li ser xwe bipejirînin ku kesek yan aliyek bibin serperiştê birayarên wan???

Piraniya nemirên " Goristana Dugurê" xwediyên kanên zêrê Kurdî bûn, lê ev goristan îro di nav rewşeke aloz û hejar de noq bûye, bê dar, bê av û bê dîwar û çeper,rewşa herî dijwartir û aloztir ku şevşevokên şevê êrîşên bê mehder û bê dilovanî ajotin ser miriyên bêdeng û bê çek. Dibe ku ev agahî bibe çihê pirsê û nekeve mejiyan de, gelo li kîjan welatî sax êrîşî miriyan dikin!? Bersev ji xwe bi sirûştî xwe diyar dikin, li welatên zordar û setemkaran ev kiriyarên bê sinc û bê pirensîp çêdibin.

Piştî min ev agahiya nexweş bihîst ez li benda derfetekê mam ku ez bi xwe herim goristanê û wan kiriyaran bi çavê serê xwe bibînim, di vê bendemabûna min ji wê derfetê re çavê min li agahiyekê bû, li nivîsekê bû, li belavokekê bû… ji kê ba û li ku ba, lê mixabin weke bêdengiya miriyan saxên me jî xwe bêdeng kirin, Dr.Bengî Haco gotareke nivîsand ew jî bi hunereke tarjîd-komdî hatibû nivîsandin û dengek bi tenê di rewşeke wisa xemgîn de hawaran nagihînin hawarhatiyan. Weke rêka çûkekî biçûk derfet bi dest min ket bi lezgînî min berê xwe da goristanê, germa rojê û germa êş û kesera wan kêlên şikestî ku hin ji wan hûrhûrî bibûn hiştin ku mejiyê min di qoqê serê min de bibe av, min ew hizir kir ku êrîşkaran aşik bi xwe re biribûn ji bo bi dilê xwe gor û kêlan bihêrin û ardikê wan kevirên hişk tevlî xakê bikin û kezeba xwe li wan miriyan hênik bikin. Ji derveyî hestê welatperweriyê birîna herî mezin û dijwar ku wê dîtinê di dilê min de vekir û ez bawerim wê demek dirêj derbas bibe ta ev birîn saxlem bibe, gora wî zarokê du salî ku bi ser rewşê de navî wî Keder bû, dîwarê hewşa wê gora biçûk û deriyê hewşê tev herifandibûn, ev jî baca cîrantiya wî rebenî bû ji wan welatpereweran re.

Ev ne cara yekemîne ku ez diçim goristanê, lê vê carê min xwest ku ez bi tena xwe bim û bi azadî gor bi gor li goristanê bigerim û tewana gunehkaran bi çavê xwe bibînim, dema ez giham ber gora nemir Dr.Qasim Miqdad ez bê hemdî xwe ji çogan ketim û min xwe da ser kevîka gorê, di kelkela wê germê de hêsrên dilop giris di gerdena min de bibûn qeşa û dilopekê jî xwe ji gewriya min berneda, Dr.Qasim Miqdad ku di dema xwe de navdartirîn zanyar bû, heke ew zanyariya xwe binivîsanda wê ênsklopêdyake Kurdî çêkiriba, roja îro ji wê zanyariya wî bitenê xwînsivî û galteyên wî li nav miletê Kurd mane. Ev mirov bê mal û bê zarok bû, wî mala her Kurdperwerekî weke mala xwe didît , ku zarokên wî hebûna wê ji yên Kurdan ne şêrîntiribana. Îro tiştek li şûna xwe nehişt ji bilî vê gora ku wî bi serdanvanên goristanê dide nasîn ev gor jî bê nav maye û kevirên ku dîwarê wê xemilandibûn tev herifandine.

"Goristana Dugirê" semboleke dêrîne ji hebûna miletê Kurd re û dîdevaneke jîndare li ser pêvajoya tevgera rizgarîxwaza Kurd di dîrokê de, ev goristan mirovên xwedî navên ronak hembêz dike,çendî kêlên ber serê van nemiran bêne şikenandin û herifandin ew winda nabin ji ber navê wan di dilê dîroka Kurdayetiyê de hatine kolandin û dîroka resen palpiştê siwarên mêrxas û lehenge wek: Mûsa begê Xwêtlî, Ebdurehman axa Eliyê Ûûnis, Haco axayê Hevêrkî, Hemze begê Muksî, Dr.Ehmed Nafiz, Arif beg Ebas û Dr.Qasim Miqdad û piraniya buhuştiyên vê goristanê ku ala Kurdayetiyê ta roja mirina xwe radestî ti hêz û ti şikenandinan nekirin.

Dema rastî ji dil derdikeve gelekî xweşe, lê gotina rastiyê li ser gelek zimanan tal û zilindare , rastiya resen ku xwe li ser gêrbendên durûtî û rûpamabûna siyasî, rewşenbîrî û olî çembike yan bendavên wan derbas bike wê bê kujtin û yan wê ji destên wan xwe bikuje, lê her jiyana tenahiyê ji gotina rastiyê re pir kême. Heger em bi xwe rastiya xwe eşkere bikin û dest deynin ser bîrînên xwînpijyayî ez nebawerim yek peyv ji gotinên rastiya me wê xwe bikujin yan bêne kujtin. Dema ez li nav wan kêlên şikestî digeriyam rastiya herî tal û zilindar xwe davêt himbêza dîrokê, bi vê rastiyê re pirsekê mêrxas xwe eşkere dikir: Çima ew qasî kîn û dexsa Hacoyê Hevêrkî di dilê dijminan de hebû û ta roja îro ev kîn û dexs roj bi roj mezin dibe??? Ji bilî gora wî, ku helwdanên şikenadina kêla wî bi êrîşkaran re têkçûbû, dika dora gorê bitenê herifandibûn , piraniya wan kêlên şikestî yên zarok û nevîyên wî bûn. Gelo sedem ji doza wî ya navdar bû ku ji berî 70 salî dixwest Kurdistaneke serbixwe ava bike? Ev doza wî ku her Kevin dibe nûtir dibe û roj bi roj bi rêya belge û dokumentan ji raya giştî re tê çesipandin ku hê tovê wê dozê heye lê ava bîrên me çikyayîne û gol û çemên me bindestin. Erê em di demekê de ne ku hizra me ya netewî zengîne lê heger ji berî 70 salî tevegra rizgarîxwaza Kurd ew tovê ku Haco yî Hevêrkî di dilê xaka vî welatî de çand ji bo avakirina Kurdistaneke serbixwe û avdabana bi yektî û hevgirtina xwe bi berdewamiya kar û xebata pêvajoya Kurdîniyê wê niha zengîniya vê pêşketina rewşenebîrî û siyasî di warekî praktik de bûya û xwe ji çarçoveya teoriyê rizgarkiriba. Ev doza ku kurê wî Hesen bi mêrxasî piştî koçkirina wî hilgirt ser milê xwe, îro çi kesê ku kêla Hesenê Haco ya şikestî bibîne ku nîvê navê wî li erdê ye û nîvê din li ber serê wî maye, nasnake bê vî mirovî di serdema xwe de çi berxweanên bêhempa kir ji bo doza Kurdî. kar, xebat û helwîstên wî di dilê dîrokê de bi tîpên zêrîn neqişandiye, ew helwîstên wî bi şoreşa Başûrê Kurdistanê re ji ser zimanên piraniya miletê Kurd ne hatiye jibîrkirin, dema dawiya pikupekê dagirt bumbe, sînor derbas kir û bi wî temenê xwe yî **60** salî xwe gihand xaka Başûrê Kurdistanê. Sed mixabin, di ber şerê dijminan re hin dengên sexte hene dixwazin tozê li ser vê dîroka dêrîn û ronak belav bikin, lê dawiya sextebûnê widabûna bi rewrewkê re ye û noqbûna di nav ava rastiyê de ye, ew jî bi saya dîroknas û lêkolînvanên Kurd yên xwedî wijdan ku rêka çêkirina zêr naskirine û vê rêkê şanî nifşên eyendeyê dikin weke:Dr.Xalid Îsa, Dr.Alî Kilîç û Dr.Ebdulfetah Elî Botanî, ku bê rawestan belge û dokumentan ji arşîvên xelkê derdixînin û dîroka xwe windayî nahêlin.

Êrîşên li ser vê goristanê bi tevahî û li ser gora Haco û zarok û neviyên wî bi taybetî ne ji valahiyekê derket, lê ev bêdengiya kor ji tevgera Kurdî derbarî vê boyerê zilindariya rastiyê tal û zilindartir dike, piştguhkirina vê boyerê cihê gazina her welatperwerekî ye ku di vê goristanê de nîştecih bûye, heke piraniya van nemiran xwedî zarok û nevîne, yên weke Dr.Ehmed Nafiz,Dr.Qasim Miqdad, Hemze begê Muksî. Musa begê Xwêtlî û gelek buhuştiyên din miletê Kurd bi tevayî û tevgera Kurdî bi taybetî çi siyasetmedar û çi rewşenbîr ji wan re zarok û xwedî ne, wan di jiyana xwe de ji bo vî miletî kar û xebat kirin, îro di mirina wan de em nikarin êrîşan ji ser gorên wan yên bêdeng û bê çek vegerînin??? Em nikarin çend şitlên zeytûn û beruwan li ber serê wan biçînin û derdora vê goristanê bi dîwar û çeper bikin, taybet bi çandina daran. Ev mirî ne mirîne, ew ta roja qiyametê zindîne, ev goristan ne kavlên dîrokîne ku şûnewarnas goran ji nû ve bikolin û li tiştên dîrokî bigerin.

Yek ji felsefa jiyanê baweriya bi jiyanê bi xwe ye, lê heke em baweriyê bi wan miriyên ku hewl didan rêka felat û jiyanên bi tenahî li pêşiya me vekin neynin emê nirxê jiyanên ku em tê de dijîn jî winda bikin. Jiyan tiştekî vala û bê havil nade, ya giring ku em xwedî bawer bin û em hewl nedin bi destê xwe dîrokên xwe yên sipî reş bikin û yên reş reştir bikin, vajî wê em li ber xwe bidin ku em xwe nas bikin û sayî û sipîbûna xwe bikin stêrên çirisî di çavên dijminan de, em jibîr nekin ku em xwedî dijminin û reştariyan bi yekbûn û hevgirtinê di nav xwe de sipî bikin. Bela hevgirtina Mesûd Barzanî û Celal Talbanî li ber çavê me be, pitşî wê qas reşahiyê ronahîya sayî û sipîbûnê bû serwerê her doz û pêvajoyên wan, êdî roj hat ku em jî ji van jiyanên bi ronak hîn bibin.

Wêne baştir diaxivin, hin gorên kêlşikestî û bênavmayî:

Haco axa Hevêrkî

Ebidelrehman axa Elyê Ûnis

Mûsa begê Xuwêtlî ... kêlên windayî

Hesenê Haco

Dr. Qasim Miqdad...gora bê nav

Ûsvê Haco û hevmala wî Efîfa Cemîlê Çeto

Cembelîyê Ûsvê Haco

Kederê du salî

Çend gor min navên wan nas nekirin